


BERBANG



ARTIST Û REJISORË KURD
YË BI NAV Û DENG
YILMAZ GÜNEY XELATA
ZËR GIRT

1/82



TEXTISTINI

J1 Berbangê	2
J1 bo Berbangeke xurt	3
J1 Kurdîstana Tîrkiyê nûçe û bûyer	6
Nûçe û bûyerên Federasyonê	7
Kovara Berbangê û nivisandina kurdi	9
Navê vê hovitiyê çiyê Federasyonê Komelên Kurdîstan lî Swêd	11
Newroz pirozkîr	12
Bejndayina edebiyata kurdi lî Kurdîstana Iraqê	15
Rewşa Kurdan	17
Hevpeyvînek bî zarokxana Rînkeby re	20
Lî ser 1 ê Gulanê	22
Lî ser rewşa Kurdîstanê Panel çêbû	23
Artîst û rejisorê Kurd yê bî nav û deng Yılmaz Guney xelata zêr girt	23

J1 Berbangê

Xwendevanên Berêz,

Berbang kovara Federasyonê Komelên Kurdîstanê -lî Swêd- e. Federasyon, J1 yekitiya komelên Kurdîstani pêk hatîye û lî ser bîngeheke demokratîk dîxebite. Berbang dê jiyana xwe, wek organa vê yekitiya Kurdîstani û lî gor bîngeha wê ya demokratîk bîdomine.

Me dî rûpelên hundîrin de lî ser federasyonê û xebata wê ya bê-tîri salekê û lî ser Berbangê bî ferehê nivisandîye. Em bawer in, piştî xwendina vê hejmarê dê girîngî û fonksiyona Berbangê jî bo gelek xwendevanên wê zelal bîbin. Dî gel vê yekê, em dîxwazî dî vî quncîki de jî we jî çend himên bîngehin yê Berbangê agehdar bîkî.

BERBANG :

* Lixweser bî zmanê kurdi û bî tipên latîni ye.

* Pîraniya rûpelên xwe jî hilberiyên çandî re vedîqetine.

* Bûyer û nûçeyên Kurdîstanê û lî ser civata Kurd belav dîke.

* Lî ser rewşa macîrên Kurd, bî taybetî, ya karkeran jînan û zarokan dînivîsîne. Mafên wan yê civakî û çandî dîparêze.

* Lî ser kar û barê Federasyonê dînivîsîne û xebata wê ya demokratîk dîde naskîrin.

* J1 bo pêşvebirin û tekûzkîrîna zmanê kurdi yê nivîsani dîxebite

* Piştîgîriya tekoşîna gelê Kurdîstanê dîke.

* J1 hemû demokrat û welatparêzên kurdi re vekîri ye.

* Girêdayî tu hêz an dîtîneke siyasê ya taybetî nîne.

* Rê nade polemîkên siyasî

Xwendevanên Hêja,

Gotîna tum jî kîrînê hêsatîr e. Lewra, em bawer in, jî bo gotîna û jî bo ku usûlê bê cih, çend rêzên jorîna fêrdîkîna. J1 xwe, va ye Berbang dî destên we de ye. Hûn dê bî xwendîna û dî çav re derbaskîrîna, wê jî nêzik ve bînasîna, prensîbên wê û şopa wê ya weşanî bî çavên xwe bîbînin.

Em lî benda rexnen we yê nivîsandi ne. J1 bir nekîna ku Berbang tenê bî rexnen we dîkare xwe bî guhurîna û dî her wari de bîbe kovareke tekûz. Heta hejmareke dîna dî xweşîye de bîminîna.

BERBANG

BERBANG - Kovara kurdi
Xwedî: Federasyonê Komelên
Kurdîstan lî Swêd.
Buha: 5 kr. Abone: 60 kr. jî
bo salek

BERBANG - Kurdisk tidskrift
Ansvarig Utgivare: Kurdiska fö-
reningsnämnden i Sverige
Pris: 5 kr. Prenumeration: 60 kr-år

ADRESS-NAVNIŞAN
Sveavägen 135 N.B
113 50 Stockholm-SWËD
Tel: 08-330709

JI BO BERBANGEKE XURT

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, yek ji armanca xwe ya girîng bi ci ani û Berbang derxist.

wek û tê zanin, di nav van salên dewin de li Ewrûpayê gelek kovar û rojnameyên Kurdi derketin û hinek ji wan berdewam in. Ev xuya dîke ku gelê me di aliyê xebata weşanî de ji gavên fireh diavêje. Nexwazme piştî cunta faşist a leşkerî li Tirkîyêpiraniya xebata weşanî kîşiyaye dervayê welat.

Di vê xebatê de Swêd ciheki taybetî digre. Beşeke mezîni jî li Swêdê pêk tê. Ji bo vê yekê ninerên dewletên koledar, yêni ku welatê me di nav xwe de parve kirine û zîlm û zordestiyên nedîtî dikin, ketine tîrseke mezîni. Carna bi gazîni û loman carna jî bi êrişên eşkere ve ew bêhîzûriya xwe nişan didin.

Lê bê şik, di nav wan xebatan de Berbang ciheki taybetî digre. Cara pêşîn e ku hemû hêzên welatperwer û pêşverû di koverekê de dengê xwe kirine yek. Em hêvidar in ku Berbang bibe meşq û nimûneke baş. Qet ne hewce ye ku em li vir li ser hevkarî û yekitiyê dûr û dirêj bisekinin. Xuya

ye ku bêî yekitiyê rast û xurt ev barê giran nayê hildan, hêzên dijmin jî hev nayên belav kirin û welate me ji tarîti û zindanan dernakeve ronahi û xweşiyê. Yek ji girîngiya Berbangê jî ew e ku nivîskar û rewşenbîrên her perçên Kurdistanê bi rîya kovara Berbangê ve dengê xwe bigihin her aliyên Kurdistanê. Bi vi awayî dê gelê me ji xebatên hêja haydar bînin.

Baş tê zanin, ku haya gelek kesan ji xebata çand û bêjeyî yêni hemû perçên Kurdistanê tune, yan jî gelek kême e. Dibe ev diwar ji ortê were rakirin û danûstandîneke germ û xurt di nav gelê me de bi her cureyî pêşde here.

Afîrandîna zîmanekî gîştî jî bo wê roleke gelek mezîni dilîze. Di vê babetê de, yek ji dijwariyên me zaravayên Kurdi ne. Lê Kurmancî û Soranî di nav xebata rewşenbîrî de jî yêni dîni cîhê ne. Piraniya gelê me bi Kurmancî dipeyive û dîni nav van deh salên dawîn de, nexwazme bi rîya belavbûna kovar û rojnameyên hêzên siyasî yêni Kurdistanê Tirkîyê ve, jî aliyê xwendîni û nivîsandîna Kurmancî de pêngavên baş hatin.

Em dîzanîni ku zaravayê Soranî jî hem jî aliyê rewşenbîrî tîş-

tên hêja afîrandîye û hem jî zaravekî dewlemend e. Ji bo vê yekê, çîqasî Berbang bi zaravayê Kurmancî be jî, nivîsarên Soranî jî dê di rûpelên wê de cîh bigirin. Em bawer in ku ev bo dewlemedtîrkîrîna zîmanê me tîşteki hêja ye.

Berbang dê bi tipên Latîni bê nivîsandîni. Ji ber ku zîmanê Kurdi bi vi awayî jî çarçewa teng derket û bû malê hemû Kurdan. Bo yekitiya zîman bû gaveke hêja. Bi sedema wê jî em ê Soranî jî bi tipên Latîni binivîsin.

Lê jî ber ku dewleteke me tune bo zîman otorîtek jî bi hêsani çênabe. Yek jî wan dijwariyan, mîrov dikare (1) ya bi kûmîk û (i) ya bê kûmîk bihejmêre. Hin kesên pişpor anxwedanîdia, naxwazîni bi şikleki dîni tipa li dervayê ya xwe bi kar binîni. Me ev da ber çavan û mecal da wan kesan ku bila wek ya xwe binivîsin. Her wîsan ev jî bo gramera zîman jî derbas dibe. Lê me bi xwe qirargirt, ku di Berbangê de (i) ya bê kûmîk bi kar binîni. Sedema wê jî bo sîvîktîrkîrîna nivîsandîni û xwendîniye. Vexwazme bo Kurden Tirkîyê hun dîbinîni ku çî dijwari henîni li pêşîya me. Lê ew me natîrsîne. Em wan baş nasdîkîni û jî bo wê yekê jî, em dixwazîni rûpelên Berbangê bîkîni plat-

forma munaqêşê. Nir û baweriyên nivîskar û rewşenbirên me di nav rûpelên Berbangê de têkevin nav şer û rastiye, ronahi bîbîn. Bê rexne û munaqêşe gavên hêja nayên avêtinê. Ji bo wê yekê, em ê rûpelên xwendevanên xwe ji vekin. Bila ew ji xwestin û ditînen xwe vekirî diyar bikin. Ev riya dîr û dirêj, bê rexne û munaqêşe, bî serfirazi dawî nayê.

Bila diyar bibe, ku Berbang girêdayîye tu hêzekê nine. Nakeve nav munaqêşên ideolojîk û tenê ditneke taybetî belav nake. Ew, platformeke netewî û demokratîk e, têkoşîna gelê me bî awakî gîştî belav dike, dide nasin.

Armanca Berbangê bî kurtî ev e:

1) Dengê Kurdan li Swêdê bîke yek, di vî civata nû de alîkarîya wan bîke, mafên wan bîparêze, li ser xwendina zîmanê Kurdi bîsekîne, xebata weşan û hwd. bîke.

2) Têkoşîna gelê me bîde nas kirin, zordestiya dijmin êşkere bîke û li dij raweste.

3) Li ser çande, bêje û diroka Kurdistanê afirandinên hêja belav bîke û danûstandinên rewşenbirî di nav hemû perçên Kurdistanê de xurtir bîke.

4) Bibe platformeke munaqêşê

Di destpêkê de Berbang dê mehê carekê derkeve û 24 rûpel bîn. Lê armanca me mehê du caran derxistîne. Em dizanin ku dê kêmasiyên Berbangê hebin û dibê ku gelek bîn ji. Lê em bawer in ku dê bî kar û xebat û bî alîkarîya we hemû Kurdên welatperwer û pêşverû, bî nivîskar û rewşenbirên Kurdistanê ve ew ê kêmtir bibe. Dê Berbang xurtir û dewlementir bibe.

Pêşniyar û xwestin û rexneyên we dê me kêf xweş bikin.

Xebat û xebirên xwe ji Berbangê re bîşînin.

—Ji bo Berbangeke xurt!

BERBANG

BO ÇI FEDERASYON

a.rıza. alan

An em bêjin "Bo çî ne Federasyon" ji dibê. Ji ber ku endamên komelan, kesên di komelan de aktif û mirovên ji jiyana rêxistîniya Swêdê piçek haydar dê pîrsa duduyan rastir bîbînin. Ne were ye gelo? Ji Tirkên heta Afrikayîyan; çî Reşîk, çî Sîpi, çî ji Zerîk, hemû civatên biyanîyan li Swêdê bûne xwedi Federasyon. Bî gotineke din, komelên xwe gihandine hev û di bin baskê Federasyonê de civiyane. Bo çî dê Kurd nebî Federasyon? Em ne bawer in ku tu kes î xwedi hiş û aql rabe, bêje "na", "me tiştêki weha navê". Lê berî berî dayîna vî pîrê, divê li ser Swêdê û xebata biyanîyan li Swêdê çend gotin bîn gotin.

Heştîyekê nîfûsa Swêdê biyanî ne. Ji welatên cihê cihê, xwedi çand û zîmanên têvel milyonek biyanî... Gelek ji van li vî derê civar bûne û êdi bî çavê welatê xwe yê duduyan dînihîrin li Swêd. Divê li vî derê bixebîtin, li vî derê bîzewicîn, li vî derê bîbin xwedi mal û zaro û li vî derê bijîn. Lê wek çî? Wek biyanîyekî an wek Swêdiyekî? Ne wek yekî ji. Wek biyanîyekî li Swêd. Hun ê bêjin ev çî ye? Ev, endamê civateke ji gelek alîyan ve modern û demokratîk, di gelek waran de pîralî û dewlemend û bî imkanên bêhejmar ve xemilandî ye. Ango xwediyê maf û azadiyên bîngêhin e. Mafê dengdanê di helbijartînan de, mafê xwendin û pêşvebirîna zîmanê zîkma-ki di dibîstanan de, mafê vejan- dîn û xwedikirîna çanda netewî, maf û azadiyên sîyasî û rêxistîni-

mafê derxistîna rojname, kovar û programên radyo û televizyonê û hwd. Lê ev gîşt rûyekî realîta Swêdê ne. Mesela esasî bîdestxistîna û bîkaranîna van maf û azadiyan ne. Ji bo vî, hêz divê rêxistîna û xebat divê. Hêz û rêxistînen biyanîyan, komelên wan in. Dewlet û beledîye alîkarîya madi û manewî dikin; Dîbêjin "fermo, komelên xwe li dara bixînin, ji xwe re ci bigîrin, em alîkarî bikin. Eger hun xwedi komele ne û komelên we gelek in, werin cem hev û federasyonê damezrinin. Bî vî awayî karê me û we tev hêsantir dibê. Em dikarin li ser hemû pîroblemên civata we bî awakî merkezi bîsekînin. Hun dikarin di her xusûsî de, bî rengêki merkezi daxwazên xwe diyar bikin û bî cî binin. Rastî ji her ev e. Swêd civata rêxistînan e. Çî ji bo Swêdiyên be, çî ji bo biyanîyan. Nine-reên biyanîyan ji, li ba dewleta Swêdê û hemû organên wê, federasyonên wan in. Ji lew re grûbek biyanî bî federasyon be, bî zîman e ji.

Li derve, li ser xebatên çandî, dibîstan, "Kurdoloji" û hwd. Gelek tê mijûl bûn. Ma we ji nebihîstîye gelo, ku hînek bî nivîtnazî dîbêjin "Kurdîstana Swêd". Ji dîr ve dengê defê xweş tê, lê, yê ku di govendê dene rind dizanin, ku civata Kurdên li Swêdê ji gelek mafên xwe bî par maye. An xwe bî par hiştîye. Eger em xwe û grûbên din yê biyanî bîdînin ber hev, ne dibîstanên zîman û mamostên Kurdi, ne programên Kurdi di radyo û televizyonê de û ne ji bî dehan pîsporên me hene.

Wek hemû grûbên din yê nî biyani; bo xwe, bo zarokên xwe, bo parastina şexsiyeta xwe ya netewî û çandî, bo ku em di nav civatek wek civata Swêdê xurt de, carek din asîmîle nebin û nehêlin, divê em xwediyê federasyonê bin. Federasyonêke bi hêz, xurt û bikêrhatî...

CIYÊ FEDERASYONÊ DÎ TÊKOŞINA GELE ME DE ÇI YE:

Tiştên li jor hatin gotin, lixurê di çarçewa şertên Swêdê û biyanîyên li Swêdê de bûn. Tenê li ser civata Kurdên li Swêdê, wek grûbeke biyanî û li welatekî biyanî bûn. Lê rewşa Kurdan ev çend ne hêsan e. Yanî Kurd ne wek her grûbeke biyani ne. Dî serê her tiştî de, bê dewletbûn û bindestiya me, me ji gelek biyanîyên din vediqetîne. Sedemên barkirina me ya ber bi Ewrûpayê çî dibin bila bîbin, aborî yan siyasi di bingeha van sedeman gîş de, ev rastî û ev trajedî heye.

Bi kurtî, welatê ku em jê tîn, welatekî bindest û parvekirî ye. Civata ku me li dû xwe hiştiye jî, civateke jihevbelavkirî û paşdemayî ye. Lê gelê me li hember vê pêtûrî(zîlm) û bindestiyê stuyê xwe xwar nekiriye û serî daneniye. Dîroka liberxwedana gelê me, bi qandî dîroka bindestiya wî kevn e. Gelê me, îro ji vê "enîvîsê" re dibêje "na". Oêls jî mabe, ji hev de jî ketibe, çarmedor dijmin be jî, dîsa bi qandî taqeta xwe dibêje "na!" Di zîndanên tarî de, li Silêmaniyê, li Diyarbêrê, li Mehabadê, ni deh hezaran mirov, bo stranên azadîyê venemire, bo tovê serbixwebûnê şîn were, bo ku êdî xîreta gelê me hew di nav dest û piyên hovan de bipelçiqe, her roj, di çerxên îşkencê de û di sêpiyên îdamê de canê xwe bi gorî dikin. Ev têkoşîn ji ber me ve û di şûna me de jî tê dayîn. Ji bo vejandin û xurt kirina liberxwedanê, girtiyên me alîkarî û Pêşmergên me çek di vên. Çek ne tenê "keleşkof"ê helbet. Çek zanîn û zanyarî ye,

piştevanîya dostan û yekîtiya di nav me bi xwe de ye jî. Dî rewşa îro de, çeka herî girîng ev e. û îro li welat yekîti çiqas pêwîst be, li derveyî welat ji ewqas pêwîst e.

Hinek der û dor ji berê dixwazîn felsefa rebenî û bêkesiyê belavbikî di nav me de. Dîbêjin "Di xebata derveyî welat de tu xêr tune" an "Tu dostên Kurdan nînin". Wek ku tu hêz kesên mirovperwer ne mabin di ruyê dinê de. Li gora vê zihniyeta kevnare, di têkoşîna xwe de, em tiq û tenê bê heval û hogir, bê piştgir û dost, bi serê xwe mane. Rast e gelo? Em bi xwe dibêjin "na". Yê nî ku dibêjin rast e, bila rûnên wek pepûk û sêwîyan li çokên xwe bixînin. Eger em hebin û destên biratiyê dirêjî hevdu bikin, di nav xwe de bîbin yek û bi hêz bin, dost gelek in.

Girîngiya piştgiriya navnetewî û hêzên pêşverû û demokrat li welatên Ewrûpayê, ji tekoşîna gelên din yê nî bindest rind di bîra me de ye. Gava em bikaribin rewşa welatê xwe û şerê gelê xwe bi partî, sendîqa, rêxistin û hwd., bidin naskirin û qebûl kirin; em dê bikaribin hêz û îmkane nî rejimên kevnepereşt li Kurdistanê qelstir û kêmtir bikin. Girêdanên wan yê nî paşverû bi derveyî welat re çiqas bê nî birîn, dê pergala wan ya gemarî ji ewqas bê tecrîd kirin. Bi vî awayî, dê hêvî û rîyên nî li ber têkoşîna gelê me vebin û dê serketina me hêsantr û nê zîktir bibe.

Komelên di federasyonê de endam in, bo ku bala gelemperî bikişînin ser rewşa welatê me û têkoşîna gelê me, bi salan xebitîne. Beşeke girîng ya xebata komelan ev bûye, û vî xebatê tesîreke mezî li ser gelek kes û hêzên demokrat kiriye. Piştî ewqas sal û ewqas tecrûbe, îro em di nuqteki de hemfikir in: Di gel ferqên bîr û bawerî û dîtinên siyasi, komelên me dikarin piraniya xebata xwe ya ber bi awira gelemperî ve li Ewrûpayê di platformeke demokratîk de bicivînin. Federasyonê Komelên Kurdistanê li Swêd(FKKS), bo yekîtiya

xebatê di vî warî de, platformeke têkûz e.

Bo em bikaribin bigihê nî hedefên li jor rêzkirî, ne tenê komele, divê her welatparêzekî Kurdistanê jî wezîfe xwe ya esasî bi cî bîne. Li welatên derve wezîfe me ya esasî propaganda ye. Yanî bihezîrî û pîrkirîna hevalbend û dilxwazên têkoşîna gelê Kurdistanê ye. Divê propaganda li gor şertên civatê bê nî kirin. Mesela carna, melodiyeke bîlura şivanekî Kurdistanê, an govenda çar govendgeran hejayî deh belavok û sed siloganan e. Tabî, ev mîsaleke piçûk e. Lê bê guman, ji aliyê herkesî ve tê zanîn, ku propaganda, tecrûbe û zanebûneke taybetî dixwaze. Divê em hemû tecrûbe û zanîna xwe û kesên xwe yê nî pispor di warên curbicur de, bikaribin li merkezekê mobilîze bikin. Ev merkez, bê guman FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD e.

FEDERASYONEKE ÇAWAN?

Federasyonê Kurdistanî û demokratîk bê şîk. Divê federasyon, xebata xwe li ser van herdu hîmên esasî bîdomîne. Ger em, fonksiyona federasyonê û faktore nî ku me tînin cem hev bîdin ber çavên xwe, xebateke weha bi tene dikare li ser platformeke bi vî rengi bimeşe. Kurdistanîbûn, bi mana temsilkirîna hemû komelên welatparêz û demokratîk yê nî ji her çar aliyên Kurdistanê ye. û demokratîkbûn, bi mana ji hemû bîr û bawerî û dîtinên welatparêz û pêşverû re vekirîbûn û bi tu hezeke yan dîtîneke taybetî ve ne giredayî bûn e.

XEBATA ŞALEKÊ

FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTAN LI SWÊD di Gulana sala rabirdû de hate ava kirin. Kongra yekemîn bi pêşengî û înisyatîva çend komelên aktîv civiya. Di destpêkê de kêmasî gelek bûn. Cara pêşîn ji her çar aliyên Kurdistanê, xwedi program û bîr û baweriyên têvel, ewqas komele, ji bo xebateke weha dihatin cem hev. Ji lew re ger di destpêkê de

hinek problem derketibin û xebat wek avê neherikibe, ji divê gelek normal bê ditin. Bo çareser kirina van probleman xebat hatiye kirin an na ya girîng ev e. Belê, bi rikoyi û serwexti xebatek dijwar hatiye kirin. Berpirsiyariya welatparezi û şoreşgeri dawiyadî bi ser ketiye û federasyon ava bûye.

Bicibûn û rûniştina rexistineke wek Federasyonê, gelek xebatên gran dixwaze. Di serê van xebatan de, danûstandinên resmî û burokratik bi hemû rêxistinên resmî re tîn. Federasyonê, li ser rewşa Kurdên li Swêdê û ji bo xwendina zimanê Kurdî di dibistanên Swêdê de, bi SÖ (serokatîya karûbarên dibistanan ya bilind) û bi SIV (Daira karûbarên biyaniyan ya dewletê) re dest bi kar kiriye. Di vi wari de projeye fireh daye ber xwe. Armanç, bi alikariya kesên pispor, organizekirin û pêşvebirina xebatên xwendinê ye. Bi belediye re gelek civin hatine kirin û li ser rewşa zarok û malbatên Kurdan çend gavên kesdar hatine avêtin. Bi komele û federasyonên biyaniyan re, danûstandinên xurt hatine pêk anin. Bi parti, sendike û rêxistinên demokratik yên Swêdî re, gelek civin hatine kirin. Di 12 Îlona derbazbûyî de, li dijî cunta Tirkiyê aksiyoneke xurt û fireh hatiye pêkanin. Bi programeke dewlemend û bi beşdarbûna hemû Kurdan ve, Newrozêke serketî hatiye piroz kirin. Meş, miting û aksiyonên w.d hatine rêxistin. Bi mamostên Kurd re û bi kesên di warên sporê de xwedienterese re civinên fireh hatine kirin û bo damezrandina komelên mesleki komite hatine helbijartin. Ya heri girîng, hejmara komelên endam di Federasyonê de, ji şeşan derketiye sêzdehan. û Federasyonê, bi vê hejmara BERBANG-ê ve dest bi jiyana xwe ya weşani kiriye.

Bo Federasyonêke bi hezîr û bo BERBANG-êke çêtir, alikari û piştevaniya we divê. We xwişk û biran... We hevalên dilsoz....



JI KURDISTANA TIRKIYÊ NÛÇE Û BÛYER

* Di şeva Newrozê de, di girtigeha Diyarbekir de 6 kes hatin kuştin.

* Li Kurdistan operasyonên leşkerî dom dikin.

* Yê nû nîvîsandin û xwendina wan tune bin, nîkarin di nexweşxanan de ji razên.

Li Kurdistan Bakûr, cunta faşîst, kuştin, bîdarvekirin, pêk anina operasyonan û bi şêleke gellempirî mafê jiyane ji navê radîke.

Li gor nûçeyan, şeva Newrozê, ew girtiyên ku di girtigeha leşkerîya bajarê Diyarbekir de bûne, di girtigehê de xwestin cejna gelê Kurd ya netewî piroz bikin. Cûnta ketiye alarimê, der û dor li girtigehê girtiye û girtigehê gulebaran kiriye. Ji girtiyan pîr mirov hatine kuştin û birindar kirin. Heta niha kes nîzane jimarên kuştîyan çendin. Li gor nûçeyên dawî dibêjin 6 kes hatine kuştin û birindar bêhejmar in.

Cûnta faşîst a leşkerî, li hundur girtiyan dukuje û li der ji, operasyonên leşkerî pêk tîne. Di 20 ê meha Nisanê de li dorhêla bajarên Mêrdînê û Diyarbekirê

operasyonên leşkerî çê kir. Bi sedan gundiyan Kurd girt; li wan xîst û wan avê te girtigehên leşkerî.

Cûnta faşîst ya mê tingehkar, ji her alî ve û bi her metodên ne merovî û çavsoyî dere ser gelê Kurd. Wê gelqirkirina gelê Kurd ya tevayî daye ber çavên xwe û planên xwe wilo çê dike. Cûntayê di derheqê xwendin û nîvîsandinê de pêşniyarek bir meclîsa şêwrê. Ger ev pêşneyar di meclîsa şêwrê de qebûl bibe û bibe zagon û derkeve; jiyana gelê Kurd bi tevayî dikeve tehlikê. Ev pêşneyar ku li ser xwendin û nîvîsandinê niha di meclîsa şêwrê de ye, weha ye:

Ew kesên ku xwendin û nîvîsandina wan tune, wê nîkarîbîn bibin memur, karker heta dergevan ji. Kesên ku xwendin û nîvîsandina wan tune bin, wê nîkarîbîn, dikanekî bi du serî sabûn û sîndocêke sêv vekin. Lê deqa pêşneyarê ya girîng ev e, ku ew kesên ku nîkarîbîn bîvîsînin û bîxwinin, çaxa ku nexweş bikevî, wê nîkarîbîn di nexweşxa-

nan de ji razên an ji tedawi bibin.

Îro dî Kurdistanê Bakûr de xwendin û nivisandin pîr kêm e. Jî sedî pêncî nabine. Bî vê zagona han, mafê jîyanê yê a gelê Kurd jî navê radîke.

LI KURDISTANA IRAOE

*Jî aliyê pêşmêrgan ve 162 leşkerên Baas hatin kuştin.

Dî meha bori de alîkarê Saddam Huseyin, Taha Yasin Ramazan, çû bû Kurdistanê Îraqê, bajarê Sîlêmaniyê. Sedemê çûndina Taha Yasin Ramazan ev bû, ku xortên Kurd bigre bin çek û wan birêke şerê Îranê. Jî bo parastina Taha Yasin Ramazan, bê hejmar leşker û polis berpirsari girtî bûn û li gel wî hatî bûn Kurdistanê.

Pêşmêrg bî hatina Taha Yasin Ramazan hesiyar û bî ser bajêr ve girtin. Şerê mezî dî navbera hêzên Baas û pêşmêrgan de çû bû. Dî şer de 162 kes jî hêzên Baas hatin kuştin. Pêşmêrgan çend taxên leşkerên Baas bela û wela kirin. Dî vî şerî de, 11 pêşmêrgên qehreman jî şehîd ketin.

LI KURDISTANA ÎRANE

*Bajarên Mahabat û Saqzê careke dî jî jî aliyê Ordîya Îranê û pasdarên Xumeynî ve hatin bomba kirin.

Dî meha bori de ordîya Îranê ya kevneperest û pasdarên Xumeynî bî hev re êriş bîrî ser bajarên Mahabadê û Saqzê. Leşkerên Îranê û Pasdar. Li van her du bajarên Kurdan gule barandin. Bî sedan, zarok, jin kal û pîr kuştin.

Îran û Îraq jî seri ve dîxwazin şerê li dij hev, li ser axa Kurdistanê bîkî û heta iro jî kîrîne.

Lê pêşmêrgên Kurdistanê Îranê bî merxasî leşker û pasdaran paş ve avêtin. Ew çend bajarên ku jî aliyê kurên Barzanî ve hatî bûn girtin û teslimê Îranê hatî bûn kirin, jî aliyê pêşmêrgan ve nûcar de hatin girtin.

NÛÇE Û BÛYERÊN

FEDERASYONÊ

Kar û xebatên Federasyona komelên Kurdistanê li Swêd.

Komela ciwanî û sporê ya Kurdên li Swêd ciwanî xwe çêkir. Federasyona komelên Kurdistanê li Swêd, girîngiya xebatên ciwanên Kurd li Swêd dîzî bû. Jî ber vê yekê, dîxwest ku komelekê jî bo ciwanên Kurdistanê ava bike. Wek tê zanîn li Swêd qasî 4000 Kurd dijîn. Dî nav van 4000 kurdan da qîsmek jî wan salên wan piçûk in û dî jîyana Swêd de gelek pêwîstiyên (ihtiyacên) wan jî bo alîkariyê hene. Jî bo ku hemû ciwanên Kurd bîcivî ser hev, avakirina komeleke pêwîst bû. Vatîniya vê komele dê dî şertên li Swêd de ciwandîna hemû ciwanên Kurd be. Ev komele, dî nav wan de dê xebatên sporê û kulturî bike. Dî tarîxa 21 Adarê 1982 an, de dî bin însiyatîfa Federasyonê de, ciwanêke gîştî bî ciwanên Kurdan re çêbû. Cîvî jî aliyê Kurdan ve

eleqeyêke mezî dî. Gelek kes dî ciwanê de bejdar bûn.

Cîvî, jî aliyê mesûlê federasyonê ve hat vekirin. Mesûlê federasyonê, bî kurtî jî bo çî awakirina komelekê sporê pêwîst e û behsa armanca ciwanê kîr û ciwanê vekir. Dî dî re kesên ku li ciwanê bejdarbûn dîtin û baweriyên xwe li ser vê xebatê pêşkêş kirin. Mînaçeşe pîrani li ser xebatê pêş de û komeleke bî çî awayî dê ava bibe, li ser van çêbû. Pîştî ku dîtin û pêşneyarên hemû hevalên ku li ciwanê bejdar bûbûn, hatin nivisandin, dest bî hîlbiyartîna komîta amadekar hat kirin. Jî bo komîta amadekar 5 nav hatin pêşneyarkirin û ew kes jî aliyê herkesî ve hatin hîlbiyartin.

Komîta amadekar vatîniya xwe bî vî awayî tesbîtkir: 1) Hazîrkîrîna program û destûra komela sporê, û jî bo kongre ya gîştî hazîrî kirin. Ev kongre dî nav meha Gulanê da dê çêbe. 2) Heta kon-

Ey hebîba ger cehenem dafî bî, tu dane bî
Sed qesem dê biçme niv de, ez bî qesda daneyê.

Mîn qebûl e ; xemr û saqî, dêr û zînar û senem
Mîn ne vêt secade û ewrad dîgel sed daneyê

Aşîqê sadîk ew e, ê ku li rîya dilberê
Ger ewî binî bî kîn, ne şkêned peymaneyê

SIYEHPOŞ

gra gîştî xebatên sporê û ji bo muracaata resmi dê xebat çêbin. 3) Dê belavokek derkeve û di nav hemû kurdên li Swêd belav bibe.

Xebata Spora Kurdistanê pêş-de diçe:

Komita amedakar, ji bo xebatê heta kongrê hinek tişt tesbit kiribû. Yek ji van tiştan ev bû ku dê xebata fûtbolê destpêke. Piştî hefteki tarixek tespit bû û xebatê fûtbolê destpêkir. Li mîntîqa Rinkeby roja şemiyê 11 Adarê xebata yekan destpêkir. Qasi 30 xortên Kurd cîvyabûn û di bin kontrola antrenorek Kurd de (A. Baksi) dest bi sporê kirin. Êdi ji bo ku gelek eleqeyek mezîn hebû, bîryar hate stendin ku hefteyeke dinê li mîntîqa Fittja yê xebat dombike. Piştî vi êdi ji heftê 2 car dê spor bê kirin.

Komela mamosteyên kurd li Swêd:

Federasyona komelên Kurdistan li Swêd, ji bo avakirina komela mamosteyên Kurd li Swêd dest bi xebatê kir.

Wek tê zanin, ku em ji aliyê federasyonê ve xebata elmandina zarokên Kurd gelek tiştêk giring

dibinin. Zarokên me yê Kurdistan ji aliyê van imkanan ve di welatê me Kurdistanê da mehrûm mane. Welatên mêtîngêhkar şûna dibistanên Kurdi de dibistanên Tirkî, Erebi û Farisî vekirine. Zarokên me asimile kirine. Ji ber vê yekê ji tu kesi bi zimanê Kurdi li dibistanan ne xwendiyê. Ev bi sedsalan qedexê bûye.

Lê li Swêd imkanên gelek mezin hene, ku em zarokên xwe bi zimanê Kurdi bîdin xwendin. Meqamên resmi yê Swêd û qanûnên(zagonên) Swêd imkanê dîdî ku kesên biyani bi zimanê xwe li dibistanan bixwinin. Zarokên Kurd li Swêd, bi zimanê xwe, ango bi Kurdi di dibistanê de karin bixwinin. Ev ji bo me Kurdan, imkanek gelek mezin e. Lê ji bo ku em ji van imkanên gelek giring istifade bikin, divê em bixebitin. Divê federasyona Kurd, ji aliyê ve û mamosteyên Kurd di aliyê ve li ser van tiştan serê xwe bi êşinin. Komela mamosteyên Kurdistan ji bo vê yekê pêwîst e.

Federasyon li ser van tiştan di nav komita karger de xeber da û bîryar stend ku civinek bi hemû mamosteyên Kurd re çêke.

Civin di tarixê 20 ê Adarê de li bajarê Stockholmê çêbû. Gelek kesên mamoste hatibûn û civinê û mesûlê federasyonê wexta civinê vekir bi kurte ji bo çî ev xebata han hatiye fikirandin, behs kir. Armanca civinê bi awaki fire vekir.

Piştî vê yekê mîneqêşa li ser mîşkîleyên mamosteyên Kurd hebû. Weki din ji mîneqêşe li ser endametiya komela mamostan hebû. Pîranî ya kesên ku li civinê bejdar bûbûn, li ser endametiye ditînen wan ew bûn; ku hemû kesên ku mamosteti dikin, hemû kesên ku bi zarokan re dixebitin, hemû kesên ku ji welat diplomên wan yê mamosteyiyê hene karin bîbin endamê komelê. Piştî gelek mîneqêşan, komita amedakar hate bijartin. Ev komite ji çar(4) kesan pêkhat. Vatîniya vê komitê ew bû:1)Hazîriya kongra yekem bike. Destûr û programa komelê hazîr bike û bine kongrê. 2)Bi hemû mamosteyên Kurdistanê li Swêd danûstandin bike ji bo bejdarbûna wan li nav komelê.

Civin bi pêşneyar û xwestinê hevalan dawî girt.



KOVARA BERBANGÊ Û NIVÎSANDÎNA KURDÎ

R.ZÎLAN

Berî her tişû, divê em şabûna xwe ya ji bo weşandina kovara BERBANG-ê, ku bi destên federeasyona komelên Kurdistanê li Swêdê tête weşandin, bidin xuya kirin. Bi qasî ku em pê dizanin, ev yekemîn car û yekemîn kovar e, ku li Ewrûpayê, bi hevkarî û hevpariya çend komelên Kurdan ve dikeve jina weşanê. Bê guman, bi tenê ev qewmandineke welê girîng e, ku divê serê her kurdekî welatparêz, demokrat û şoreşger pê bilind bibe. Teqez em dizanin, ku dê ev qewmandina ha, dilên dijminên keda destên gelên me û herweha dilên dijminên dewlemendiyan têvel yên Kurdistanê û hebûnên netewî yên gelê Kurd pê xweş neke. Bi a me, kovara BERBANG-ê bi xwe jî serwextê van çend tiştan e. Ji lew re, wê di gel hinde çetinahî û dijiwariyê jî, karûbarekî ewçend giran û girîng daye ser milên xwe û pê radibe. Hêvî û daxwaza me ew e, ku BERBANG, her texlit karûbarê xwe bi serbilindî bibe serî û tede bi ser bikeve...

Li ber çavan e, ku di warê weşandina kovareke kurdî de, pirs û pirsgerêkên xuya yanî yên nependî gelek in. Di gel vê pêrabûnên kovarê bi xwe jî pir in. Hêçî

pêrabûna bi Kurdîke zelal û xwerû nivisandin e, bi a me, armanca sereke ye. Bê guman, kovarek bêî rêziman û awakî nivisandinê î misoger nikare bigihêje vê armancê. Ji ber vê yekê jî, divê awayê nivisandina Kurdî yê kovarê, yek ji pêrabûnên herî girîng bê te hejmartin.

Di rewşa îroyîn de, nabe ku kovarekeKurdî li gor daxwaza dilê xwe û zanyariya zimên dût, rabe û rûne û bibizive. Heke welê nebe dê di zimanê Kurdî de birinên mezin vebin. Dê hîm û bingehên zimanê Kurdî yên nivisandin û xwendinê bîn birîndar kirin. Berpirsiyariya vê kir û kirdarê jî pir giran e. Hiç mafê me jî tune, ku em bingehên zimanê xwe aloz bikin. Ji ber ku ziman ne yê bi tenê kesekî yan jî tof û rivdekê ye. Lê belê ew yê gel e.

Li milekî din, rewşa xwendin û nivisandina gelê me, rewşa zarava û devokên wî jî xuya ne. Heke em, di gel hinde pirs û pirsgerêkên dijar û giran, rabin hîn di destpêkê de pêngaveke ziyandar pêşde biavêjin, divê bê te gotin ku em şaş in. Rê û rêça ku me daye ber xwe, ji feydê bêtir, zîrar û ziyane tîne.

Dabaşa me ya vê kurtenivîsare, li ser alfabejn zimanê kurdî

ye. Bê guman, gava em ji alfabe-ya zimanê Kurdî kad dikin, em bi tenê ji tîpên Kurdî û awayê nivisandinê hewal nadin. Lê belê, em ji fonetîk, morfolojî û sintaksa Kurdî jî kad dikin û wan qet ji ber çavên xwe bi dût naxin. Ji ber ku ew hemû bi hevdu ve girêdayî ne.

Em bi xwe di wê baweriyê de ne, ku divê zimanê Kurdî bi tîpên latînî û li gor alfabe-ya HAWAR-ê bê te nivisandin. Têvî vê jî, çawan ku alfabe û awayê nivisandina HAWAR-ê ji zimanê Kurdî re, herwekî ku li perçên din yên Kurdistanê û li hemû zanîngeh û unîversitên ku lê pişka Kurdnasiye hene, bûye bingeh, her wisan divê ew ji Kurdên Tirkiyê re jî bibe bingeha nivisandinê. Divê Kurdên Tirkiyê di warê nivisandinê de, serê xwe bi hîç û pûçî ji alfabeke nû û ji awakî nû î nivisandina zimanê Kurdî re neêşînin. Li tiştine nû negerin, tiştine nû ji ber xwe bi dernexin û çenekin. Ziman ne mijûlî û ne jî "hobi" ye. Divê ji bîr neçe, ku mafê hîç kesekî tune, ku bi zimanê Kurdî ve bilîze. Berê pêşveçûna vî zimanê, çi yê nivisandin û xwendinê û çi jî yê axaftinê, bi alîkî bervajî de yan jî bi alîkî

tiji bi asteng de bide.

Bi a me, di şûna -î-ya Kurdî de -i- ya Tirkî û di şûna -i- ya Kurdî de -i- ya Tirkî nivîsandin pir şaş e. Ji ber ku hem -î- û hem -i- ya Kurdî ne wek -i- û -î- ya Tirkî ne. Ji aliyê fonetîkî de ferqeke pir mezîna di navbera wan de hene. Heçî -i- ya Tirkî ye, li gor ya Kurdî, Kurt e. Ji lew re Tirk, heta bi îro jî, gelek peyvên Iranî (Farisî, Kurdî û hwd.) û erebî, yêna di zimanê Tirkî de çih girtine û herweha di zimanê Osmanî de jî dihatin bi kar anîn, bi tîpa -i- ve dinivîsin. Em, li vê jêrê, ji wan peyvên bi tenê çendekan berpêş dikin. Ji bo berpêşkirina wan peyvên, me bi lez û bez, çend peyv ji ferhengê "Mustafa Nihat ÖZÖN, Büyük Osmanlıca Türkçe Sözlük, İnkilap Kitabevi, İstanbul-1959, 3. Baskı" bi derxistin:

"Alif, asib, asil, arıza, bih, bahil, bihefgen, cîran, cihanbîn, cebîn, çin, dik, dilîr, ferîh, fasile, galil, gazîr, istîsal, istîmam, ihtîzar, ihvan, hiş, hiredest, kiş, mişin, mîsak, lif, lîme, nîze, nîran, pîr, piş, rih, rik, sib, sih, tîb, tîn, zîb, zîba,....."

Heta di ferhengê "Türkçe Sözlük, Türk Dil Kurumu Yayınları sayı 293, Ankara-1969, 5 baskı" de jî ev celeb -i- mişe ne.

Herweha, wek tete zanîn, navdêrên neberbiçar, "îzafê" û rengdêrên ku ji zimanê Iranî û Erebi ketine Tirkî û Osmanî jî bi paşpirtika (paşdam) -i- ve tîna nivîsandin. Wek: Germî, bîzarî, heykeltarşî, hunî, azmî, faciavî, esedî, ilmî, ... û hp. Lê belê, niha zimanzanên Tirkan bi navê paşpirtikîna zimanê Tirkî, di şûna paşpirtika -i- de, paşpirtika -sel-, -sal (ji ber ahenga dengên carina-cel) ya Fransî bi kar tînin. Wek madensel (madenî), hukuksal (hukûî), gûncel (yevmî) û hwd.

Vêca divê em li vir bipirsin û bêjin ku: Gelo Tirk çima hin peyvên Iranî û Erebi bi -i- ya dirrêj ve dinivîsin? Gelo zimanzanên Tirkan, ku ev hinde sal in bi pakijkirina zimanê xwe ve mijûl in, evçend nezan in, ku vî tîpî jî

alfabeya xwe bi dernaxin? Gelo em bi vê nezaniya xwe ya zimanzanîyê ve, zimanzanên Tirkan zanetir in, ku em dev ji -î- û -i- ya xwe berdînin? Bersivên ku di vî warî de tîna dayîn, wek: "Ev jî Kurdên Tirkîyê re hêsantir e", ne bersiveke zanistî ye. Heke dabaşa me bes li ser "ji Kurdên Tirkîyê re hêsantirbûn" be, wê caxê divê Kurdên Tirkîyê bi temamî li gor awa û destûra zimanê Tirkî binivîsin (!?). Çawan be, zimanê Tirkî dizanîn, awa û destûra nivîsandina zimanê Tirkî jî dinasin û pê dinivîsin jî (!?)....

A rsatî ev çihê pêkenîne ye. Lê ew çendî çihê pêkenîne be jî, ewçend jî çihê mixabûnê ye. Em ê li alîkî yekbûna zimanê Kurdî bixwazin û jî bo vê armancê jî tîbikoşin, lê li alîkî din jî em ê bêjin: "Ji Kurdên Tirkîyê re çer, ji Kurdên din re jî wer"!....

Heçî -i- ya Kurdî ye, wek pir Kurdîzanan jî gotine, du cûre ne. Yek jî wan pir kurt e. Wek di peyvên -tişit- de. Yek jî wan jî ne hinde kurt e. Wek di peyvên -tîvir- de.

Wek xuya ye, heke hin dengên zimanê Kurdî bi yêna zimanê Tirkî ve bîna guhartin û bi tîpên Tirkî ve bîna nivîsandin, bîngêna fonetîkî yêna zimanê Kurdî tîna birîndar kirin. Ji bilî vê yekê, divê tucaran jî bîra me neçe, ku zimanê Kurdî zimanekî Indo-ewrûpî, lê zimanê Tirkî zimanekî al-tayî ye. Ew, ji her aliyê ve, jî hevdu pir dûr in.

Bi kurtbirî, gava em guh nedînin yekîtiya zimanê nivîsandin û xwendinê, em nikarin di warê yekbûna zimanê Kurdî de pêngavên berbiçar biavêjin. Ji lew re, heke hin bawer bin ku, ji Kurdên Tirkîyê re holê hêsantir e, bi a me, şaş in. Heye ku dîr nabînin. Bi hînbûna bi tenê du tîpan ve ziman zor nabe... Li milekî din jî, gava zaravayê Kurmanciya jêrin (soranî) bi tîpên latîni dinivîsin, alfabe ya HAWAR-ê bi kar tînin, ne ku guhartokeke din. Heke Kurdên Tirkîyê dev ji ya xwe bernedînin, dê bibin sebebên ser-

gêjîyên mezîna û tîkçûna ziman û bêjeya Kurdî.

HAWAR-ê carekê jî nivîsandina Kurdî ya bi tîpên latîni re bîngêna daniye. Ev hinde deh sal in, ku Kurdî li ser wê bîngêna tîpê nivîsandin. Hinde Kurd û hinde zanîngê û unîversîte jî ew pejirandîye, pê dinivîse û dinivîsin. Lê çihêfê û, mixabin e, ku em çet bala xwe nadin van rastîyan. Her jî ya xwe nayên xwarê! Nema, heke her kesê ku bes Kurdîya axaftîna bizanibe, lê bi ser de jî xwepisporê zimanê Kurdî bihesibîne, tiştîna çepel û şaş bêje û bîfîrîne, divê mirov ne bi tenê destekî lê belê herdu destên xwe jî dayne ser dilê xwe. Bi hemû karîna û şiyana xwe ve hewl bide, da ku dilê nebihure. Lê, li ber çavan e, ku zimanzanî ne karê her kesî ye. Ew bi serê xwe zanyarîke pir texlît e.

Hêvî û daxwaza me ew bû, ku redaksiyona kovara BERBANG-ê, di warê nivîsandina Kurdî de, biryarîna berbiçav werbigire, da ku rê li aloziyên nivîsandina bêne girtin. Lê sed mixa bin, ku welê nebû. Ji lew re jî, wek hun bi xwe jî dibînin, kovar bi yek awa û alfabe ve nehatiye nivîsandin. Bi a me, ev kêmasî, heta şaşîke mezîna e. Lê bi qasî hindê jî, redaksiyona kovarê ew sernermî û serwestî nîşan daye ku rûpelên kovarê jî gotûbêjên zanistî yêna li ser vê babetê re vekirî bin. Herweha, redaksiyona kovarê dixwaze, ku di pêşerojê de komcivînan zimanzanîyê li dor bixe û li ser vê pîrgirêkê biryareke nû werbigire.

Heçî zimanê Kurdî ye, tiji pîrs û pîrgirêkê nîşan dijwar e. Pîrs û pîrgirêkê nîşanê kûr û wisan aloz, ku jî taqeta yek yan jî çend zimanzanan derbûna wan, bê guman e. Heye ku jî wan re çaredîtîna ne karê îroyîn be. Teqez, bi tenê akadêmîke Kurdî dikare jî wan re çare bibîne.....

Êdî em, careke din BERBANG-ê jî dil û can pîroz dikin, di gel serketîna wê, jî kedkarên wê re jî xweşbextiyê dixwazin.

NAVÊ VÊ HOVİTIYÊ ÇIYE?

"Emr"ê lı jêr, ji aliyê serokê Belediya Diyarbekir ve hatiye nîvandın û belavkırın. Serokatîya Belediya Diyarbekir pêşî, vi "emr"i bi hmû karker û memûrên Belediyê da xwendın, imze kırın. Dı dû re, xıst nava camekanekê û lı ser dergeyê Belediyê daleqand. İro hin ji daleqandi ye. Daleqandi ye, ji bo ku her kesek ku dıkeve Belediyê û derdıkeve rûreşiya wan bi çavên xwe bıbıne. Em orjinalê vê dokumentê û Kurdiya wê çap dıkın, da ku hun ji bibının, wergerının zımanê bıyani û belav bıkın.

Jı Amerikaheta Afrika jêrin, lı gelek heremên Dınê hin ji bermayên nijadperestiyê dıjin. Lê ne bi vê ecêb û sosretê! Em ne bawer in, ku zihniyetek ev çend iptidai, hov û kevneperest, dı heymana me de, lı hin derên dın ji mabe. Nijadperestiyek bı vi rengi vekırı û eşkere, dı diroka beşeri de, tenê dı pergala kole-dari û mêtingehkariyê de jiye.

Ev dokument, gelek vekırı, ideolojiya Dewleta Tirk, siyasetaya wê ya asimilasyonist û pergala wê ya kevneperest şani dıde. Jı bo gelê Kurd ev siyaset nû nine. Dewleta Tirk, ji destpêkê heta niha, bê ku ji tu kesî û hezi şerm bıke xwestiye zımanê me, stranên me, çirokên me û destanên me inkar bıke. Ne tenê inkar kırın; carna bı qanûn û fermanên xwe bı dıbistan û pirtûkên xwe; carna ji bı polis û cendirmên bı işkence, bı kuştın û bı bıdarvekırınan xwestine hebûna me ji bin ve vemırının.

Lê bıla Generalên Tırkiyê, yên çavsor û lep bı xwin rınd bızanıbın ku gelê Kurdistanê, heta niha çawa lı ser pıyan û zinde mabe; ji niha pê ve ji, dê tevi çand û zımanê xwe jindar bimıne.

Ev ferman û qanûn bê feyde ne. Bê feyde ye ev hoviti. Zımanê bist milyon insan bı fermanan nayê birin!

KOMARA TIRKIYÊ SEROKATIYA BELEDİYÊ DIYARBEKIR

Hejmar:45

Mewzû:Lı ser zımanê peyivînê
8.7.1981

1-Bına merkezi ya belediyê têde, lı şûbe, şefiti û şantiyên dın, memûr û karker bı KURDÎ dıpeyivın, dı vê xusûsê de malûmat gıhiştine meqamê serokatıyê.

2-Ez naxwavım bawer bıkıım ku bı vi rengi tê peyivın.

3-Lê dema ku ez, dı nav memûran de û dı seatên mesai de, kesên ku dı şûna(TIRKÎ) de (KURDÎ) dıpeyivın tesbit bıkıım,

dıvê rınd bê zanın, ku ez ê derheq wi memûri û wi karkeri de mûamela çeti bıkıım.

4-Madem em mına hemwelatıyên Tirk dıjin, dıvê em bı TIRKÎ bıpeyivın.

Carek dın ifade dıkım. Gava ku dı saetên mesai de, lı odê, lı şantiyê û lı çiyê kar û memûr û karkerên ku bı KURDÎ dıpeyivın bên tespit kırın; şefê wê serwisê ji têde, de derheq wan de mûamela qanûni bê kırın.

5-Ev emr, dê bı hemû personel, lı hember imza wan, bête xwendın û sûreteki wi ji serokatıyê re bête şandın.

Rıca mın bı ci anına vê yekê ye.

İMZA

Feyyaz ÜZÜMCÜ

P.ALB.

Serokê Belediyê

Jı BO BELAVKIRINÊ:

Jı Cıgırıyên Serok re

Jı hemû Serwisan re

T.C.
BELEDİYE BAŞKANLIĞI
DIYARBAKIR

PER : 45
KONU: Konuşma lisansı Hk.

8.7.1981

Tamamlik BİZE.

1- Belediye merkez binası dahil, diğer şube, şeflik ve şantiyelerde memur ve işçilerin KURTÇE konuştuklarına dair bilgiler Başkanlık makamına ulaştırılmış bulunmaktadır.

2- Bu tür konuşmanın yapıldığını inanmak istemiyorum.

3- Ancak gerek memurlar arasında ve mesai saatleri içinde (TÜRKÇE) yerine (KURTÇE) konuşmaları tesbit ettiğim anda o memur ve işçi hakkında kesin işlem yapılacağı çok iyi bilinmelidir.

4- Madem Türk Vatandaşı olarak yaşamaktayız o halde TÜRKÇE konuşmalıyız.

Tekraren ifade ediyorum.Mesai saatleri içinde oda da, şantiyede, iş yerinde KURTÇE konuşan memur ve işçi tesbit edildiği anda o servisin şefi de dahil olmak üzere haklarında kanuni işlem yapılacaktır.

5- Bu emir bütün personele imza karşılığı okutturulup imzalı bir şekilde Başkanlığa gönderilecektir.

Gereğini rica ederim.

DAĞITIM:
GEREĞİ :

Başkan Yardımcılıklarına
Bütün Servislere

Feyyaz ÜZÜMCÜ
P.Alb.
Belediye Başkanı



ARARAT

Newroz destana raperin û serhildana gelê Kurdistanê ya diji zûlmê û zordestiyê ye. Newroz destana stûxwarnekirîna ye. Ew çanda gelê me ya şoreşger e ku wek nişaneke xiretê ji sedsalan bî vir de di nav gelê me de hatiye xwedi kirin.

Her sal 21ê Adarê de, ji bo biranina serhildana Kawe yê hesinger û hogrên wi tê piroz kirin. Ew wek sembola tekoşin û azadiyê li her çar aliyên welatê me bî cejn û şayi tê piroz kirin. Newroz an ji "Nûroj" destpêka biharê û mizginiya jiyaneke nu dide. Di wê rojê de zincirên koletiyê hatine qetandin û di wê rojê de dijminê koledar wek berfa biharê li hember hêza gel heliya ye.

Her sal dema ku 21ê Adarê tê, li ser çiyayên Kurdistanê agir tîn vexistin. Ev agirên han, çirûskên azadixwaziyê û serhildanê teze dîkin. Her sal dema ku Newroz tê, dijminên gelê me, carekê disa tînin bira xwe ku dawiya wan dê wek dawiya Dehaqê xwinmêj e. Û her car zûlm û çav-

soriya xwe li ser gelê me zêde dîkin.

21ê Adarê, di wextê de roja tekoşina li diji nijadperêziyê û kolonyalizmê ye. Ev yeka ha mana Newrozê iro ji bo me girîngtir û xurtir dîke. Duh Dehaqê koledar dijminê gelê me bû, iro ji kolonyalizm, emperyalizm û faşizm e. Wan pirozkirina Newrozê ji li gelê me qedexa kirine. Ew dîzanin ku gelê me dê zû an ji dereng nîrê kolonyalizmê bîşkêne, dawiya zûlmê û kedxweriyê bine. Ji ber vê yekê ye ku ew bî hemû hoviti û çavsoriya xwe ve êrişî gelê me dîkin.

Lê gelê me ji koletiyê re stûyê xwe xwar nake. Iro li Kurdistanê Îran û Iraqê agirê Newrozê bî destên pêşmergeyên gelê me yên mîrxas hatiye bilind kirin

Li Kurdistanê Tirkîyê, bî hezaran welatparêz di zindan û girtgehên kolonyalist û faşist de di dilê xwe de piroz dîkin. Gelê Kurdistanê li ber xwe dide û dê bide ji, heta ku Newrozeke nû biafirine.

FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ NEWROZ P

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, di roja 13'ê Adarê de Newroz piroz kir. Di şeva Newrozê de bi nêzîki 1200 kes beşdar bûn. Di mercên Swêd de ev hejmareke gelek bilind e. Ev baş nişan dide ku hevkarîya hêzên welatparêz dengê gelê me yê bîndest bilindtir dîke.

Programa şevê pîr dewlemend bû. Şev, bî folklor, tiyatro, hel-



ASYONA KURDISTAN VÊDÊ ÎROZ KIR!



best, stran û rayidana dêmenên ji her çar aliyên Kurdistanê ve hatibû xemilandin. Programa şevê bî çanda gelê me ya dewlemend û azadixwaziya gelê me ve hatibû hûnandin. Dî şevê de beşdarbûna welatparêzên ji her çar perçên Kurdistanê, atmosfereke mîletiyê peyda kiribû. Herweha gelek rêxistin û kesên biyani ji, ji bona gelê me piştgirîya xwe nişan dan.

AXAFTINA ŞEVA NEWROZÊ

Geli mê van û hevalên hêja!

Newroz, sersala Kurdistanê, cejna netewî ya gelê Kurd û roja serhildana xebatkarên lî dijî zordestî û kedxwariyê bî xêr û xweşî hat. Hûn hemû bî xêr hatin!

Federasyona Komelên Kurdistanê lî Swêd pêşin e ku lî Swêd Newrozê bî hevra û bî serfirazi piroz dîke. Cara pêşin e ku, Kurdên lî Swêd bî hejmareke hevqas mezin û bî dileki hewqas germ tîn cem hev. Lew re, iro dî xebata me ya lî Swêd e roleke mezin dilize û wek gaveke dê bira me hemiyande bîmine. Hêviya me ew e ku, ne tenê dî pirozkirîna Newrozê de em werin cem hev, lê her wisan dî rojên din de ji em nêziki hev û du bîbin, alikari û piştgirîya hev û du bîkin. Dîvê roja Newrozê bibe navgîna birati û yekitiyê dî gelê me de û dî nav hêz û kêsên welatparêz de.

Ev gava girîng çîqas zûtir bê avêtin, dê tekoşin û xebata gelê Kurdistanê ji hewqas pêşd here rizgarîya gelê me hin zûtir bibe. Dîvê em tu car ji bir nekî ku rizgarîya gelê me bê yekiti û

hevkarîya tevgerên pêşverûyên Kurdistanê tu carî ne mumkin. Dîvê em tu car ji bir nekî ku iro ev daxwaz, yek ji daxwazên herî girîng gelê Kurdistanê ye. Gelê me yekiti û hevkarî dixwaze.

Hevalno, Geli Mivanên Hêja,

Îro û her roj xebata gelê Kurdistanê ji bo jiyaneke serbixwe û azad geş dibe. Gelê me dî Newroza isal da ji, lî dijî Dehakên nû, bî çek, bî stran, bî hêvi û bawerîya Newrozê azad lî ber xwe dîde.

Lî aliyeki welatê me i Kurdistanê Pêşmergeyên mîrxas û egî lî ser çiyayên bilind û azad ji bo pêşdixistin û serfiraziya tekoşina gelê Kurd dîxebatin. Lî aliyeki dîne, bî deh hezaran gundî, karîker û ciwanên Kurdistanê dî nav eniya çekdar de dî axa rîzgarkirî de, ji bo avakirîna civateke teze û jiyaneke mîrovî, Newrozê piroz dîkin. Lê welatên kolonyalist ji zordestî û tadekariyên xwe yê nî ser gelê me her roj zêdetir dîkin. Lî Kurdistanê Tirkîyê, bî hazaran keç û xortên Kurd, dî zindanên





dewleta kolonyalist e dê nîkarî-
bîn wek her car agirê Newrozê
bî xweşî û serbestî geş bîkîn. Ew
dî bîn zîlm û kedxwarîya mîro-
vên cûnta faşîst dî bîn îşkencan,
dî bîn mercên nemîrovî lî zînda-
nan tekoşîna man û nemanê dî-
kîn. Cûnta leşkerî ya faşîst bî ha-
tîna lî ser karîne, xwîn lî gelê me
vereşandiye. Hed û sinorê zordestî-
ya cûnta leşkerî ne kîfş e iro.
Lî Kurdîstana Iraçê rejîma nijad-
perest ya sedam Husên alîkî de û
rejîma kevneperest û fanatîk ya
meleyan lî Kurdîstana Iranê zîlm

û zordestîya xwe lî ser gelê me bî
her awayî diajon. Lî Kurdîstana
Suriyê jî Kurd dî bîn mercên dij-
war de, bê mafên mîrovî dijîn.

Dî diroka Kurdîstanê de gelek
roj hene ku gelê me lî hember
zordestîyê, lî hember tîda û lêda-
nên kolonyalîstan serê xwe hîld-
dane. Lî her çar perçên Kurdîs-
tanê iro jî serhîldana karker û
gundîyên Kurdîstanê hin geştir
dibe. Welatparêz û demokratên
Kurdîstanê iro bî xwîna xort û
keçên Kurdan destanan dînvîsi-
nîn. Tekoşîna wan dê bibe diro-

ka Kurdîstanê.

Heval û hevalbendên me bî can
û xwîna xwe ve diroka Kurdîsta-
neke serbest, civateke teze dînvî-
sîn. Cejna Newrozê dî diroka
me de êdî jî bûyereke efsanewî
derketîye, her gav dî jîyana rojê
de, dî tekoşîne de bûye sembola
serhîldîna, nişana rîzgariyê.

-Bimre kedxwarî, zordestî û te-
dakariyên kolonyalîstan!

-Bijî tekoşîna gelê Kurdîstanê!

-Bijî Newroz!



Bejndayina Edebiyata Kurdi Lı Kurdîstana Iraqê

ROHAT

Edebiyata Kurdi zûda bûye keriki(beş) edebiyata cihanê. Hetani niha lı herçar perçên Kurdîstanê gelek nivîskar, helbestvan û ronakbirên jêhati ghiştine. Wan hertim serê xwe xistine ber xwe û bî dileki şa baweriyên xwe rokirine lı ser rûpelên spi. Bi destê wan hetani niha bi sedan efrandinên rındik û delal hatine nivîsandın. Hinekani bî zımanê dayka xwe—Kurdi va, hinekani ji lı Kurdîstanê ji ber zordestiyên gıran bî zımanên Tırki, Erebi û Farisi nivîsine. Tışteki zev zelal û berbıçav e ku, van hemûyan dı efrandinên xwe da, bî taybeti serê xwe li ser rewşa welatê xwe êşandine. Niştımanperweri bûye sertaca xebata wan. Bi xurti wan dı karên xwe da êş-bırin, derdkulên gelê Kurd nıtrındine.

Paşi şerê cihanê yê yekemin bî taybeti lı Kurdîstana Iraqê edebiyata Kurdi pır pêştı çû û ghişte menzileke mezın. Bılındbûna şer-doza gelê Kurd û rêhıldana edebiyata Kurdi berhev ketın. Wan hev xemiland. Bılındbûn û Şaxvedana şer dı nav edebiyata Kurdi da ciheki fıreh gırt. Bı vi tehri edebiyata Kurdi xwe ra çavkanik dit ji aliyê dın pêştıçûyına edebiyata Kurdi ji, bı xurti bo rjên serketinê rolek mezın list. Bo vê yekê mirov nıkare edebiyata Kurdi û doza gelê Kurd lı Iraqê ji hev bıde çetandın(qutkırın).

Jı despêka şerê çekdari vır da lı Kurdîstana Iraqê dı navbera edebiyata Kurdi û rewşa politik da peywandiyên şıdyayi û xurt ha-

tin pêkanin. Ev dan û standın dı efrandinên edebi da pır zelal û xuya ye. Bejndayina karên politik ji bo pêştıbirına zıman, çand û edebiyata Kurdi da roleke mezın list. Wek derketına rojnamên XEBAT(DDK-I), AZADÍ(PK-I) ŞOREŞ(PŞ).....

Dı dawiya sedsalıya(qurne) 19'an û despêka sedsalıya 20'an da, lı Kurdîstanê hışyarbûneke mezın hat xuyan. Gelek kesên niştımanperwer êdı nıkarıbûn ewqas bêdeng bımının û lı ser doza Kurd çavên xwe bıgırın, guhên xwe bıxıtımının. Dı nav van salan da lı gelek welatên bındest şer-doza hebû û dewlete Osmani (mırovê nexweş) bere-bere hıldıweşıya. Lı welatên Belgan gelên bındest seri hıldabûn. Hêzên imperyalist çav berdabûne axa(erd) Kurdîstanê û bı taybeti hemû giraniya xwe dabûne ser beşê Kurdîstana Iraq.

Dı nav van salan da lı Kurdîstana Iraqê hêdi-hêdi bı zaravê(di-yalekt) Sorani gelek tışt despêkır, hat nivısandın. Dı despêkê da sê helbestvanên Kurd bı vi zaravi va efrandinên xwe nivısın, NALÍ(1880-1856), SALÍM(1805-1869) û KURDÍ(1812-1850). Lı hevanina xetên wan bı tehrti dı bıni siya edebiyata Erebi da mabûn. Dı nav xetên van hersê helbestvanên Kurd da mirovhezı, hub-evinti û welatparêzi ciheki fıreh digre.

Helbestvanê nav û deng HECÍ QADÍR KOXÍ(1816-1894) hemû giraniya xwe dı van salan da dati-

ne ser azadi û rızgariya gel. Ew peyketiyê Ahmedê Xanê ye û dı rıya wi da meşıyaye. Ew ji bertunebûna yekıtıya êl-êşırên Kurd pır ber xwe dıkeve. Lê ew xemgın, dılsar û bınteng nine, ew gelek bawerıya xwe bı gel tine.

Dı dema ku imperyalistên İngiliz, erdên Kurdîstana Iraqê zevt kırın, vi çaxi zane, pıspor û nivıskarên Kurd dı nav xwe da gelek komel û rêxıstın saz kırın. Wan dest bı weşandına rojname û kovarên Kurdi kırın. Dı vê demê da tevgera gelê Kurd lı dıji imperyalizmê derdıkeve. Bı vi tehri hêzên niştımanperwer hebûna imperyalizmê lı Kurdîstanê xwe ra wek dıjınnek mezın dıbının. Dı sala 1917'an da, bûyına şoreşa Oktobré dı nav gel da bûye bayisê hışyarbûneke mezın.

Doza Mehmud Mazenci(1922), Şex Ahmet(1930) û Xelil Xoşavi(1935) dı van salan da dıghêje bılınddahıke mezın. Hêzên imperyalist bı hêzên kevneperst û nijadperest va hevra zordestıke bêhempa lı ser gelê Kurd pêktının. Dı nav vê rewşê da nivıskar û helbestvanên Kurd xwe dıdıne pêşıya hemû çetnayê û dıjwariyan. Jiwana yek ji BEKES e. Dı vê demê da BEKES(1905-1948) tê gırtın. Bêkes gelek salên xwe dı gırtıgeh û bendixana da derbaz dıke. Lê ew hemberi hêzên kolonyalist bı zıreki çalaki û jır-jêhati şer dıke. Gırtıgehên teng û tari bo gelek nivıskarên Kurd bûne dıbıstan.

Ew dı gırtıgehê da gelek xetan dı

hev rêzdike. Dî xebatê xwe dâ dinivise ku "Welatê min ez weki dina te hez dikim" wi kurt û hindîk nivisiye, lê bî tehreki rindîk xetên xwe bî hevaniye.

Li Kurdîstana Iraqê navê AHMET MUXTAR BEG dî nav van salanda (1897-1935) baş tê bîhistînê. Ew dîf bîndestiyê û jî bo rîzgariya welatê xwe jî hev xweştir gelek xetan lî dûhev rêz dîke. Ahmet Muxtar Beg dî sala 1935'an da bî destê sekbav û berdevkên hêzên kolonyalist da tê kuştînê.

Şex Rîza Talabani(1842-1910) dî jî dewleta Osmani dî helbestên xwe da xurt radiweste. Paşî mirîna wi, dî sala 1935'an da diwana wi ya yekemin lî Kurdîstana Iraqê tê çapkîrîn. Ew dî nivîsarên xwe da qîrfê xwe bî Osmaniyan dîke, bî wan dîkene û kevirîne mezîna xetên xwe da davêje Osmaniyan Padişahên dewleta Osmani lî ber çavên wi reş dîbin û helbestên xwe da dest jî pêsîra wan bernade. Disa bî navên XARİK (1855-1909)

ALİ KEMAL BAPIR, XAMDÎ çend nivîskarên dîna jî dî vê demê da dengê xwe lî hemberî dijîmîna bilîndîkîna û dî dewrana komara Mahmut Berzenci da ew xwe dîdîne pêşîya hemû tengasî û dijwariyan.

Nêzkaya şerê cihanêyi duweminjê dî nexş-nîgar û reng-awazên nû dîkevîne nav edebiyata Kurdi. Naveroke edebiyata Kurdi rengîna û dewlemendîbe. Cure-cure efrandînen nû tîn çapîkîrîn û hejmarîna nivîskarên Kurd her dîçe zêde dîbe. Jî wana gelek dijî faşîzmê, kedxwariyê û kevnepersîyê radiwestîna. Ew dî efrandînen xwe da derd-kulên karker, gundî û rençberên Kurdîstanê bî firetî dîmîtrînin. Biratîya gelên Erebi-Kurd, internasyonalîzma proleterîyayê û aşîtiya(edlayê) cihanê edebiyata Kurdi da ciheki fireh dîgre.

Dî nav vê nîfşê da helbestvanê mezîna DILDAR(1918-1948) ser van babetên jorîna helbestîne xweşik dînivise. Ew kesekî zane,

hişyar û pêşverû bû. Ew rabûyey-ranebûyey serê xwe jî bo xelasiya welatê xwe eşandiye. Mizgîna hatîna rojên serketîne dî xetên wi da baş dîçûrîsîn. Ev bawer-mendî û serhişkiya wiya dî marşa navê "Ey Raqîp"da pîr zelale. Ev marşa Dîldar nivîsiyê iro lî çar beşên Kurdîstanê lî ser lîvên her welatparêzekî Kurd şûn gîrtîye.

Edebîyata Kurdi lî Kurdîstana Iraqê bal û guhdariya kevnepersîtên Erebi hertîm kîşandiye ser xwe. Dest bî dest wan pêştîçûyîna vê edebîyata Kurdi bend kîrîna û eê nedane ku edebîyata Kurdi bejn bîde û gulvede. Dî nav van salan da veşartî an jî niv-veşartî dîzikava gelek kovar û rojnemên Kurdi hatîna veşandîna. Wan dî pêşketîna edebîyata Kurdi da roleke pîr fireh listîna, wek jîayana (1920 Suleymaniya), Banga Heq(1922-Suleymaniye), Diyari Kurdîstan(1925-Baxdet) kovara Zari Kurmancî(1927-Baxdat) Gelavêj(1939-Baxdat), Dengê Geli Teze(1943-Suleymaniyê), Nîzar(1948-Baxdat)Netew(1954-Erbîl), Hêvî(1957-Baxdat) Roja Nûwe(1958-Suleymaniye), Xebat 1959-Baxdat), Biratî(1970-Baxdat). Disa dî nav van salan da gelek kovar û rojnemên dîna jî car-carna dî hîne quncîkên xwe da şûn dane edebîyata Kurdi, wek Bira Nû, Gîyanê Kurdîstan, Şem Kurdîstan, Şefeq, Azadî....Bî destê İbrahim Ahmed dî sala (1939'an da lî Iraqê bî navê Gelavêj'navê Stêrka Sîbê') kovarek hat der-xîstîna. Vê kovarê jî bo pêştîçûyîna Edebîyata Kurdi roleke mezîna list. İbrahim Ahmet himdareki edebîyata Kurdaye û dî vî wari da keda wî pîr derbaz bû. Disa rojnema "Dengê Getî Teze" bî taybetî dijî-faşîzmê gelek efrandînen edebî ci gîrtîna.

Bo berevkîrîna zargotîna Kurdi pîremerd(1867-1950) pîr cedandî warê edebîyata Kurdi da navê wî xweş hate bîhistîna. Wî xên jî xebatên folklorîk wusan jî gelek helbest û serhadî nivîsiye. Jî aliyê dîna wî destaneke bî navê "Donz-deh Sîyarên Merivanê" pêkani û

nivîsi.

Dî warê pêşketîna edebîyata Kurdi lî Iraqê dî hemû aliyana de GORAN(1904-1962) pîştîevanî û alîkarîke mezîna nîşan da. Dî nav hêzên demokratîna navê wî baş hate bîhistîna. Jî bo parastîna aşîtiya, Cihanê Goran pîr karên hêja pêkaniye û bûyey nûnerê "Komala Aşîtiya Cihanê" lî Iraqê. Çêend caran ew çûyey-hatiyey Sovyetîstanê û jîyîna Sosyalîst bî çavên xwe va dîtiyey. Wî gelek helbestên azadî, bîrayetî û pêşketîne nivîsiye. Jî aliyê dîna Goran bî navê "Bukeke Nekem" û "Gula Xwîne" du listîkên tîyatroyê efrandiye.

Jî bo parastîna mafên karker û gundîyên xîzîna û jî bo xelasiyey hêzên bîndest helbestvanê pêşverû -DILZAR gelek rojên xwe dî gîrtîgeh*: dî nav çar diwaran da derbaz kîrî. Wî nalîna gundîyên belengaz, dengê şîvanan-gavanan û qîrîna karkerên Kurd dî efrandînen xwe da baş nîtrandiye.

Hêzên şovenîst tu car û tu wext dîl nekîrîne edebîyata Kurdi pêştî here. Van hêzên zordestî jî bo ortê rakîrîna yekîti-pîştîevanîya navbera gel û nivîskarên Kurd da pîr cedandîne lî ser nivîskarên nîştîmanperwer pîr zordestî pêkanîne. Nivîskarê pîr camêr MARUF BARZANCÎ(1921-1963) jî bo vê yekê bî destê Baasên Cellad hat kuştîna. Wî welatê xwe zef hez dikîr, tenê gunê wî ev bû. Bî rastî edebîyata Kurdi nav mercên dijwar, teng û çetîna da bejn daye û gulvedayey. Nivîskar û helbestvanên Kurd gelek rojên reş, tîrş, tal û bî jahr dîtîne lê navê wan hertîm lî ser dilê gundî, karker, rençberên Kurdîstanê ciheki germîna dîtîne. Disa dî vî rîya çetîna da tu nivîskareki Kurd şunda venekîşyayey û wan xwe dane lî ber hemû tengasî û dijwariyan. Jî nû va gelek helbestvanên nû gîhiştîne, wek CEMAL ABDULKADIR BABAN-, AHMET PEŞEW, DILAN: KAMURAN, ABDULVAHÎT NURÎ, ÇIRUSTANÎ û gelekên mayîna.

REWŞA KURDAN!

werger:A.Tigris

Wek tê zanin, ev du sal e ku ji aliyê VPK(Partya Çepên Komînistên Swêd) ve pêşniyarnamayeke li ser rewşa Kurdan, di parlamentoya Swêd de hatiye pêşkêş kirin û li ser pîrsa Kurd, di parlamentoyê de raberzîna çêbû. VPK prensibeki girtîye û dibêje "Heta ku pîrsa Kurdan nekeve Koma Milletan, em dê her tim vê pêşniyariya xwe di parlamentoya Swêd de biparêzîm."

Em niha vê raberzîna duyem li jêr pêşkêşî we dikim.



Parlamentêrê VPK Oswald SÖDEROVIST

Oswald SÖDERQVIST(VPK)

Serokê berêz! Ji raberzîna me ya cara dînan heta niha, di rewşa Kurdan de çet guhartîneki baş çê ne bû. Ev grûba gel, li Rojavayê Asyê-li Rojhilata-navîn an jî navê wê çî dibe bla bibe, di van bûyerên dawî de, bi şêleke ber bi neketî û nebaş tesîr dît. Em, jî hemû bûyer û gûhartînen vê herama han agahdar in. Di şerê navbera Îraqê û Îranê de herama Kurdan çawan derbe dixwe, em baş pê dîzanin. Disan em baş dîzanin,

ku li Tirkîyê cûnta hincrandîna xwe zêde dîke û êrişên xwe yê gîran daye ser gelê Kurd. Em, disan dîzanin ku, Li Îraqê tîda û nekesî li ser gelê Kurd dom dîke û jî rewşa berê jî xirabtir e. Li derî van, di pêşneyara xwe de, em, karîna diyarbîkî, ku li Suriyê jî hincrandîneke nedîtî li ser Kurdan heye. Ji ber van yekînan dîvê, em, bala xwe bîdîm Kurdîstanê û sedemên bûyerên wê.

Bi vê hawa ku, komîsyona kar

girtîye
û barên derveyî mijarê destê xwe li gor par pîrî jar e. Bi dîtîna dîvê navberê de ev tiştên ku çê bûne nedana ber çavan. Di pêşneyar me ya ku karîna Swêd zilmê protesto bike weha tê gotin; Ciyê Swêd di vê mijarê de vekîrî û zelal e. Lê belê di derheqê vê mijara han a taybetî de rewşeke konkret û bi biryar nehatiye diyar kirin. Mijar bi tevayî û bi şêleki yar hatiye girtin, rewş di nav xwe de tevlehev e. Ji ber vê yekê

nîkare bala gelemperiya cihanê bikşine. Daxwaza me ev bû ku, komisyona kar û barên derveyi, vê pîrsa gruba gel, bî şêleki bîryardar piştgrîya (destek) a wê ya navnetewî bike. Mîna di hevûdûtîna xwe yêna çûyî de ji diyar kiribû ku, ev grûba gel ya mezîna pîrr kevn e û di herema xwe de bû hezar sal e ku diji. Birvekirîna wan ya tevayî ez, ecayîb dibînim.

Daxwaza me ya duyemîn ji ev bû, ku kirdayetîya Swêd vê daxwaza me ji bo raberzîna bîbe nav saziyêna navnetewî. Gava yekem K.N. (Koma Netewan) bûya. Ditîna komisyonê, ji bo vê mijarê, nîha gelemperîyeke hazîr nîne û ji vê yekê girtîna mijarê û destê xwe qezenç nayîne. Ev şêl û iro, di çiyê xwe de nîne. Ev tê vê manê ku, ji bo vê gruba gel, çet destekeke gelemperî tune, ji bo wê ji xebatê ne hêja ye. Ev rewşa han, ji bo wan endamên ku di komisyona karên derveyî de ne, ne şerm e? Ew weha ye' Rewşa Kurdan me intrese nake, lewra di vê babetê de herkes weha dîzane. Bî a mîna ditîna komisyonê, pîrr jar e û ne di çiyê xwe de ye; bî şêleki ku ji dozê birevî, formîle kirîna.

Wezirê kar û barên derveyî, li ser doza Kurdan hînekî lîkolîn çê kirîye, ez jê agahdar im. Ev lîkolîn li ser bûyerên îsal e.

Lê belê, nûnerên Sweêdên K.N., çet ne remane, ku doza Kurdan bîna komisyona mafên merovan ya K.N. Dest bî karekî weha nekîrîmê. Ew kesên ku di saziya K.N. de an ji ew biroqrîtîna ku di K.N. de dîxebîtin, doza Kurdan carek be ji negirtîna destê xwe û nîkarîna bêjîn, ku daxwazeke me ya wîsa bûye ji. Bî însiyatîfa Swêd, karekî weha bî cîh bîhata, ne rewşeke çak bû? Weha bûya ne dibû? Ji bo xebateke weha, gelo çî pingar li pêşîya Swêd hebû? Di derheqê vê mijarê de, ez bersiv ji serokê komisyonê dîxwazim.

Li London, gruba piştgrîya mafên hindîkan (bindestan) heye û di vî wari de xebat dîke. Ev gru-

ba han, ji bo mafên Kurdan, di komisyona mafên merovayî, di K.N. de xebat kirîye. Lê çet serfiraz ne bû. Ez dîxwazim bî grûba han re peyvendi bîne danîn. Ger em, ji bo mafên bindestan wan nasdîkîn, çîma em, bî wan re peyvendi danayîn? Ew li London dijîn û Gunnar MYRDAL ji wan yek e. Merov ji bo cerbandîna dozê, bîbe KN: ez bawer im, ku ji bo prestîja Swêd ji wê tiştêki baş be. Ez bawer nînim, ku em, ji vî ya tiştêki wenda bîkîn. Ji bo qezenca Kurdan ez ê pêşde ji, bî van daxwazên xwe, derkevîm hîzûra we. Ez dîxwazim hun vê pêşneyara VPK qebûl bîkîn.

STURE KORPAS(C)

Serokê Berêz! Par jî me wek vê pêşneyarnamê, pêşneyarnameke girtîbû destê xwe. Ew çax ji mîna û Oswald SÖDERQVIST, me li ser rewşa Kurdan, ditîna xwe pêkeş kirîbûn. Ew çax ji û iro ji di navbera me de bî û baweriyêna newekhev tune bûn, tune ne. Ji vê yekê ji raberzîna dirêj re an ji nîcar kirîna sedemên sala parî ne di cîh de ne. Ez ji raberîya Oswald SÖDERQVIST wîlo tîdîghîjim.

Komîsyon, îsal ji wek sala bo-rî, bî xwediyê pêşneyarinaman re ye û wek wan dîrame; wek ku Oswald diyar kir, li Kurdan neheqî dîbe, di derheqên wan de doz vedîbîm. Li Tîrkiyê Cûnta leşkerî, Şoreşa Îranê û şerê dinava Îran û Îraqê de, li pîrrê cîyan rewş hîna ji xîra bû.

Jîyana Kurdan ya mafên mirovî li welatê wan, di sîya Fîlîstîniyan de maye. Li pey kîşandîna tîxûban (sinoran) li Asya Pêş, di nav van tîxûban de gelên din ji man. Ev minak ji bo Ermenî û A-sûriyan ne ji.

Komîsyon ji bo xebata gramîya mafên mirovî, xebatake bê hempa pêwîst dibîne. Swêd di vê xebatê de roleke aktîv dilîze. Ev ji aliyê herkesî ve diyar e. Wek cîh girtîna mîna ya li gel Kurdan û gelên din yêna bindest tiştêki xwezayî (tebîî) tune. Ji vî ya re,

di parlamentoyê de gengazîya pêşneyariyan, mirov çet nabîne. Çaxa ku pîrs aktuel bîbe, mana wê ji ew çax di K.N. de an ji organên navnetewî de wê girîngîya xwe bîde qebûl kirîm. Bawerîya me komisyonê, ev e, ku wek pêşneyarê xwediyêna pêşneyarname, doza Kurdan bî rewşeke formel ji K.N. û ji organên navnetewî re bîrîn, bê mane ye. Wek me di rapora komisyonê de ji sedemên wê pêşkeş kirî bû, di ho-yêna nîha de serilêxîstîneki wîlo serfirazî nayîne. Em bawer im, ku serilêxîstîneki bê serfirazî, ji qezençê bê tîr, zerar tîne.

Ez bî xwe, naxwazim li diji ditîna Oswald a "wexta dozê nîcar çav de bohrandîna hatiye bîseki-nîm.

Lê, ez, alîkarê domandîna pîrsê û van pîrsên din im û ez dîxwazim van pîrsan hemû yan bî hev re binîn. Ji sedemên tesadûfî divê em, ji bo vî geli û gelên din hereket nekîm. Li gor remana komisyonê, ji bo Kurdên ku xwe spartîna Swêd girtîna bîryara bî yekîtiya dengîna bî mana ewle dîrîyê tê. Welatê me, ji bo piştgrîya wan û mirovên wan yêna li Îran, Irak, Suriye û li Tîrkiyê û ji bo grûbên din yêna, ku tîna pelçîqandîna ewledariya xwe diyar dîke. Em li diji ne wekhevî ya cûr be cûr in; ew gelên ku ji bo bawerîya politik, olî, nijad an ji ji sedemên etnîkî tîna pelçîqandîna, em li gel wan in. Serokê Berêz, ez dîxwazim pêşneyarnama komisyonê bê qebûl kirîm.

OSWALD SÖDERQVIST(VPK)

Serokê Berêz; ez bawer im, ku komisyona derveyî dîgera Swêd a karê derveyî û karîna Swêd pîrr di nêzde di derheqê dozê de bî bîryarî tewreki bigre. Ji bo gelemperîya cihanê iro, bala xwe hîna ji zêde daye ser vî dozê. Ji me re ji bîdîlxweşî silavdayîna wê dîkeve.

Ez dîxwazim bêjîm, ku Sture Korpas li ser mijara Kurdan ya ku mîna girtî bû destê xwe, tiştêki

pirr erini û baş got. Ez tēnagi-hēm, ku çima ji aliyê dewleta Swêd ve hin ji zû û vekiri bîşaf-tuna mijarê naxwaze. Min di ra-beriya xwe de ji diyar kir ku ev, ji bo prestija Swêd ya navnetewî çaktir bûbûya. Ev ne ji bo ku ba-la Kurdên ku li Swêd in bîkşine. Ya giring ji ev ne bû. Lewra, ew li Swêd spartox(multeci) an ji, ji hin sedemên din ji bîminin ciye-ke wan yê ku serbest bigerin he-ye. Ew ji Swêd e. Li deri wi, ji bo kurdên ku li welatê xwe dijîn û gelên din yên ku li her hera-mên cihanê hindik û bîndest in, hêviyeke heri mezîn bûbûya.

Dawiya raberizanan hat.

Parlamentaran dest bi dengda-nê kîrîn. Pêşneyar a Oswald 15 deng û ya komisyonê ji 285 deng stend.

PÊŞNEYARNAME

Oswald û çend kes ji VPK li ser rewşa Kurdan van pêşneyar-an pêşkeşê parlamentoya Swêd kîrîn:

1)Parlamentoya me, ji kirdayeti-ya(hukmeta) me re bi tenê an ji, ji hin dewletên din re ji bo doza Kurdan bîbin K.N û organên nav-netewî insiyatif dîde.

2)Tada û hincrandina ku li Tirkî-yê, li Îran û Iraqê li Kurdan di-be, ji aliyê parlamentoya me ve bê protesto kîrîn.

Bîngêhê bori;

ji aliyê parlamentoya me ve sa-lek berê ji rewşa Kurdan ya germ û teze di çav de hatî bû buhartin. Komisyona kar û barên derveyî rewşa Kurdan û ciyên, ku li wê der dijîn di sala 1980-81 an de pêşkeş kirî bû. Komisyon, bê tîr li Tirkîyê, li Îranê, li Iraqê li ser mafên kulturi, û di demeki dur û kûr de ji, li ser tekoşina çekdari ji bo serxwebûnê bal kişand. Tev-gera ji bo serxwebûnê di serfirazi-yeke edlayire rê venekir. Bi tay-

beti li Tirkîyê û li Îranê daxwa-zên Kurdan nehatin qebûl kîrîn û bi şêkleki barbarî pêl kîrîn. Ko-misyonê, di rapora xwe de ji van sedeman, zîlm û zordestiya ku li Kurdan dibe dabû diyarkîrîn. Ge-lê Kurd di navbera çend dewle-tan de hatiye parve kîrîn. Wek li jor di raporê de ji hatîbû diyar kîrîn, nivê Kurdan li Tirkîyê û yê din ji li Îran, li Iraqê û grûbên biçûk li Suriyê, Yekitiya Sovyetê û li Lubnanê ne. Di derheqê tev-gera Kurdan de agahdariyên, ku mirov bi wan bawer bike tunene. Jumara Kurdan di nav 6 û 16 mil-yonan de tê gotin. Heta qala ji-marên mezîn dikin. Hinek çav-kani, ji bo Tirkîyê 9 milyon şan dîdîn. Lê li gor makamên Tirkî-yê yê fermî(resmî) 2,2 milyon Kurd hene.

Ji ali çend dewletan ve per-çebûna KURDAN, li pêşiya daxwazên wan yê ji bo ser-xwebûnê pingar çê dîke.

Kurdan ji bo inkar kîrîna grûbê gelan, diji kirdayeti-yên zordar têkoşin dane. Sala bori, di dema raberzîne de, ko-misyon bo ku dozê bîbin K.N. baweriya xwe bi şanseki jar ani-bû. Wan dewletên ku navên wan derbas bûn, di K.N de ji bo ma-fên welatî bi peymanên politik ve nehatine grêdan û ji van sede-man ji, di rewşeki wilo normal de doz nayê vekîrîn. Wezîrê kar û barên derveyî, Ola Ullsten, di 18 ê Çileyê 1980 de di parlamen-to de çaxa bersiva pêşniyarnamê da,"Di herêmê de rewşa siyasi û haziriya gelemperiya navnetewî de gengazi tune" gotî bû.

KOMISYON

Wek di pêşneyarasala bori de ji, hatîbû diyarkîrîn, komisyon, li gel xwediyê pêşneyarê, ku dibê-

jin Kurd li welatê xwe tada, hin-cirandîn, lêgerin û ne wekhevîyek dibînin. Hoy li gor west kare bê guherin û rewşa Kurdan li çar welatan ne wek hev e. Lê vekiri-ye ku mafê Kurdan qet tune-ye. Di derheqê mafê xwe yê netewî de nikarin bir û baweriya xwe di-yar bikin. Ji darbeya Tirkîyê ya leşkerî, ji şoreşa Îran û ji şerê Î-ran û Iraqê şûn de, rewşa Kurdan hin ji xerabû. Li gor bir û baweri-ya komisyonê divê mafên Kur-dan yê kulturi, siyasi û welatî bê nas kîrîn û di pratîkê de ji bê cih kîrîn, divê merov aktiv bixe-bite. Divê, tada, hincrandîn û lê-gerina ku li ser Kurdan heye, wek hincrandina li ser gelên din bê protesto kîrîn. Ji bo giramiya ma-fên mirovî û cih bûna peymanên navnetewî kar û bar bi lez zêde bibe. Bi toreya divê kirdayetiya Swêd di rewşa han de aktif be. Qet yek bi şêleke du dîli li tewrê Swêd yê ji bo pelçiqandîn, ta da û hincrandina mafên mirovî ne-nêhre. Pîrsa Kurdan ji dîkeve vi tewrê Swêd. Hinekî Kurd xwe spartine welatê me.

Li pey diyariya jorin pêşniya duyemîn bi cih hat. Pêşneyar a Oswald û hevalên wi nehat qebûl kîrîn.

Di benda 1 an ya pêşneyar de bo ku Swêd pîrsa Kurdan bibe K.N, pêşneyarî ji parlamentoya Swêd re hatîbûn kîrîn. Komisyo-nê berî qala van pingaran kirîbû-Bo ku rewşa Kurdan di K.N de, an ji di hin organên bîngêhi de bi şêleke serfirazi cih bigre, piştgi-ri û alikariyekê mezîn dixwaze. Niha hoyên wisa negihîştîye û tune ji.

Li gor baweriya komisyonê, şansê serfiraziyê pirr hindik e. Ji ber vê yekê, ji qezencê bê tîr, ze-rar tîne û em vê pêşneyaran paş ve vedigerînin.

Komisyon ji parlamentoyê red kîrîna pêşneyar dixwaze.



HEVPEYVÎNEK BI ZAROKXANA RINKEBY RE

Bangîn

Bi kurtî tu dikarî xwe bidî naskirin? Navê min Hêvî ye. Ez ji Kurdistana Sûriyê me. Ev sê sal û nîve ku ez li Swêd im. Ango ez di 1978'an de hatim Swêd. Niha, ez li hêlîna zarokan kar dikim.

Te kînga dest bi vî karî kir?

Min, di sala 1979 de dest pê kir. Min pêşî li hêlîna zarokan li beşê Erebfî kar kir. Ji ber ku li Sûriyê min bi zimanê Erebfî, li dibistanê xwendiyê. Bi rastî min dixwest, ku ez zarokên Kurdan xwedî bikim. Vê dawiyê, çend zarokên Kurd anîn hêlîne beşa Swêdî, anga tevî zarokên Swêdî bûn, ji ber ku ta niha beşa zarokên Kurd li hêlîne tune. Îro em sê kes in. Em her sisê jî, hem bi zarokên Kurdan, hem jî bi zarokên Swêdîyan mijûl dibin.

Her wekî tê zanîn li Gamlabyplan (Rinkeby) 3-5 beşên zarokên Kurdan tên vekirin, derheqê vî tiştî de, dîtina we çî ye?

Em, vî tiştî gelekî baş dibînin,

ji ber ku berî her tiştî zarokên me, zimanê xwe hîn dibin û pêş de dibin, û bi vî awayî zarok hêbûna xwe ya civakî û kulturî diparêze. Ji alîkî din ve gelek problemên din ji ortê radibin, wek îzole bûyîn, danûstandinên nav zarokan bi taybetî dê û bavê wan dikarên bi serbestî herin kar û jîyana xwe ya sosyal û aborî hal bikin, û her wekê ku tê zanîn gelek zarokên Kurd li dervene. Li hêlîne çî ne girtine.

Karê we çawa ye û ta îro guhdana ji bo zarokan çawa derbaz dibe?

Karê me, baş e. Lê tinebûna beşê zarokên Kurd, li hêlîne hîn problemên praktîkî derdixe, wek personalên Kurd, nikarin bi serê xwe hareket bikin, problemê herf mezin ew e ku beş ne jibo zarokên Kurdan ne, ev jî dibe sebeb, ku em nikarin xwe gor şartên heyi organize bikin û bixê bitin.

Îro çend zarokên Kurd li hêlîne hene, gelo di vî dema pêşîya me de, de

zêde bibin yan na?

Îro 6 zarokên Kurd, li hêlîne hene û ez bawer im, ku pêşte zêde bibin. Ew jî dibe sebebê vekirina beşa Kurdî. Eger bi rastî beşa Kurdî vebe, wê caxê karê me baştir û organize dibe.

Hun dizanin, Îro li Swêdê Federasyona komelên Kurdistanê heye, gelo xwestin û peşnêyarên we ji federasyonê çî ne?

Bi rastî em gelekî kêfxweş in, ku îro yêkîtiya Kurdan li Swêd di çarçava federasyonê de xwe nîşan dide. Em hêvî dikin, ku xebata federasyonê bi her awayî pêşde here. Ji federasyonê daxwaza me ew e, ku jibona vekirina beşa Kurdî xebat bike, û ji me re û zarokên me re, hîn imkanan peyda bike. Ji alîkî din ve, ji bo allên Kurdan mijûlayî bibine û wê kûrtir û dewlementir bike.





CEJNA 1 Ê GULANÊ, CEJNEKE HERÎ PAK U SERBILIND E

Roja 1 ê Gulanê, roja yekiti, piştgirtî û têkoşina karkerên hemû Cihanê ye. Çina karker ji sed salan vir de, li dij kedxwaran, xwinmujan û mêrkujan ala tora xwe ya pak û serbilind, bi şêleke serfiraz bilind dîke û pêşte dimeşe. Heta iro, roja 1 ê Gulanê bi hêsati nebûye cejna karkeran ya navnetewî. Karker û xebatkarên, di bin merc û rewşên pirr dijwar de têkoşin dane û xwina xwe rijandine û dirjinin ji. Iro ji, li gelek welatan pirozkirina cejna 1 ê Gulanê qedexeyê. Kurdistanê ji, ji van welatan yek e. Welatên kolonyalist nahilîn cejna 1 ê Gulanê, cejna karker û xebatkarên, li ser Kurdistanê bê pirozkirin.

Ji lew re sazûmana kolonyalîstani ser him û bingehên kedxwari û xwinmijiyê hatîye avêtin û sazkirin.

Ev sazûmana gemar, geni û pûç bi zordari û bi çek diparêzin. Lê, hêzên kolonyalist û sermayedar, bila sebe di ber xwe didin, ev sazûmana pûç û geni, bi qetab û pinikan nikarin bidominin. Dawiya wê pirr û pirr nêze. Diroka 1 ê Gulanê ji, vê rastiyê şanê me dide.

Îsal disan, di tevayîya Swêd de cejna 1 ê Gulanê bi şêleke girsî û gelemperi hat pirozkirin. Hemû kuçe û kolanên bajarê Stockholmê bi alên sor hatin xemlandin. Sloganên ji bo piştgirtî, a-

likari û aşiti bi deveki hatin avêtin. Li Swêdê cûr be cûr meş û miting çê bûn. Lê ji wan meş û mitingên herî mezîni girsî didin bûn. Yek ji van rêza LO (Sendîqa karkerên Swêd), ya din ji ya VPK bû. Di rêza LO de qasi 25 hezar kes û ya VPK de ji qasi 20 hezar kes meşîyan.

Federasyona Komelên Kurd li Swêd, di rêza VPK de meşîya. Korteja federasyona Kurd, gelek direj bû. Kortej bi disiplin bû. Ev kesên ku di korteja Federasyona Kurd de meşîyan, van sloganan avêtin: Biji 1 ê Gulanê, Cejna Karkeran ya navnetewî, ji Kurdistanê re piştgirtî, Bla bîmre rejîma Tirkîyê, Iraqê û Iranê!....

ARTIST Û REJISORÊ KURD YÊ BI NAV Û DENG YILMAZ GÜNEY XELATA ZÊR GIRT



Artist, rejisor, niviskar û pişekarê Kurd yê bi nav û deng Yılmaz Güney, li Fransê, di festivala Cannes de, bi filma xwe ya "RE" xelata zêr qezenc kir.

Yılmaz Güney, Kurd e û Kurdeki şoreşger e. Yılmaz, ji malbateke xızan e. Çaxa ew 21 salî bû û di universite de dixwend, kirdayetiya(hikmeta) Tirk, ji sedemên parvekiriyê 7,5 cezayê giran dabû Yılmaz. Di dema xortitiya Yılmaz de sinemayê bala wi kişand. Yılmaz Güney dest bi rejisori yê, artistiyê û dagerandina

filman kir. Di salên dawî de wi li Tirkîyê di mijara sinemayê de şoreş çêkir. Ji bo filmê xwe jiyana û têkoşina çîna karker û gelê Kurd hilbijard.

Di sala 1970 de Yılmaz Güney bi filma xwe ya "UMUT"(Hêvi) li Ewropayê nav û deng da. Kirdayetiya Tirk ji ber vê sedemi deh(10)sal cezayê girtigehê da wi û wi avete girtigehê. Di 1974 de bi efuya gîştî Yılmaz ji girtigehê derket. Peyê vê derketina wi çend meh paşê hakîmekî faşîst hat kuştin û kuştina wi kir

rîn ser Yılmaz Güney û 18 sal ceza disan dan wi. Yılmaz 7 sal di hucrê de ma heta par, meha çotmehê wi gengaziyên revê dit û reviya Ewropayê. Artistê Kurd Yılmaz Güney, beriya reva xwe di girtigehê de senaryoya filma xwe ya "RÊ" nivisand.

Di vê meha ku em têdane e Yılmaz bi filma xwe "RÊ" bejdarê Festivala Cannesê bû. Di festivalê de xelata zêr qezenc kir. Ji vê yekê awira gelemperi ya Ewropayê, li ser jiyana Yılmaz, pişê û filma wi ya dawî, ya ku xelata zêr qezenc kir "sekni.

LI SER REWŞA KURDISTANÊ PANEL ÇÊBÛ

Geli xwendevanên jir û hêja!

Federasyona Komelên Kurd li Swêd, li ser rewşa Kurdistanê, li bajarê Stockholmê, di roja 3 yê Gulanê sala 1982 an de paneleke pêk ani.

Di panela sisê yê Gulanê de, ji partiyên çep yê Swêd heta yê


rast çih girtin. Ji bil partiyên siyasi her weha nûnerên rêxistinên navnetewî yê mafên mirovî ji, di panel de bejdar bûn. Di panel de bi gelemperi li ser pîrsa Kurdistanê hat seknandin û ji her çar perçên Kurdistanê nûçe û bûyerên ter û teze li nava hatin raxis-

tin.

Geli xwendevanên delal; hun dê nîvisara me ya li ser panel-raberizînê di hejmarê me ya duymîn de bibinin û bixwinin.

Berbang





.....
Mi ri nê vajey.
Ez kewto erey.

Deme' w- ki pêşmergey

«bê nav û nişan» gulan feka yê

Dêrsim dir, Mehabad dir, Dihok dir.

Ez «etnik» o.

«etnik bir grup»-grubêk etnik-

.....

Malmisanij